

See discussions, stats, and author profiles for this publication at: <https://www.researchgate.net/publication/350471041>

ÎSLAM, ÎSLAMÎZM, DEWLET Û NETEWEPERWERIYA KURDÎ

Book · March 2018

CITATIONS
0

READS
83

1 author:



Kamal Soleimani

The College of Mexico

57 PUBLICATIONS 126 CITATIONS

[SEE PROFILE](#)

Some of the authors of this publication are also working on these related projects:



Kurds, Religion, Ottoman Empire, Education [View project](#)



Islam nation and nationalism in the middle East [View project](#)

Ev xebata ku ji nivîsên cuda pêk têt, mijar û temayên curbicur ên derbarê dîroka Kurdistan, îslam û neteweperweriyê de vedikole. Şexsiyetên cuda yên kurd ên dîrokî, wek Şêx Ubeydulahê Nehrî, Seîd Nursî, Şêx Seîd, Îsmail Axayê Simko û rewşenbîrên kurd ên li Stenbolê yên sedsala 19emîn têne vekolandin. Ev lêkolîn li ber ronîya xebateke dirêj a li ser belgeyên dîrokî pêk têt. Belgeyên li ser van babetan bi riwangeyeke înterdisîplîner têt lêkolandin.

...

Dîroknûsiya kurdî, wek formeke xwe-fahmkirina kurd a paşê, gelek zêde di bin bandora fahmên kemalîst û pehlevîyan ên derbarê kurdan de maye. Ev xebat hewl dide ku hin rengdanên van şaşiyên heyî pêşkêş bike.

ISBN: 978-605-81608-7-3



9 786058 160873

peywend - lêkolîn

ÎSLAM, ÎSLAMÎZM, DEWLET Û
NETEWEPERWERIYA KURDÎ

KAMAL SOLEIMANI



ÎSLAM ÎSLAMÎZM DEWLET Û NETEWEPERWERIYA KURDÎ

KAMAL SOLEIMANI

Wergera ji îngilîzî: Fexriya Adsay



PEYWEND

**ÎSLAM, ÎSLAMÎZM, DEWLET
Û NETEWEPERWERIYA KURDÎ**

ÎSLAM, ÎSLAMÎZM, DEWLET
Û NETEWEPERWERIYA KURDÎ
Kamal Soleimani
Wergera ji îngilîzî: Fexriya Adsay

Weşanên Peywend: 44 | raman
Edîtora Kitêbê: Fexriya Adsay
Serastkirin: Bahadîn Akhan
Rûpelsazî û Berg: Şemal Medya
Wêneyê Bergê: Mohra Şêx Ubeydullah. (Çavkanî: Kovara Kürt Tarihi, h. 9.)

ISBN: 978-605-81608-7-3
© Weşanên Peywend
Çapa Yekem: 2018, Stenbol

Çap:
Sadık Daşdöğen – Berdan Matbaacılık
Davutpaşa Cad. Güven San. Sit.
C Blok No: 215– 216, Topkapı / İstanbul
Tel: (0212) 613 12 11

PEYWEND

Maltepe Mah. Davutpaşa Cad.
TİM-2 İş Merkezi, No: 8 Kat 2 D. 515
Topkapı - Zeytinburnu / İstanbul
Tel: 0532 176 93 64
E-Mail: peywend-@hotmail.com
Sertifika No: 28947

ÎSLAM, ÎSLAMÎZM, DEWLET Û NETEWEPERWERIYA KURDÎ

KAMAL SOLEIMANI

Wergera ji îngilîzî: Fexriya Adsay

 KEYWEND

Kamal Soleimani: Doktoraya xwe di 2014an de li Zanîngeha Columbiayê xilas kir. Babetên xebatên wî dîroka Îslamê û siyaseta Rojhilata Navîn e: Îran, Iraq, Tirkîye û Kurd. Li Tirkîyeyê, li Zanîngeha Artukluyê ya li Mêrdînê û li NewYorkê li City Collegeê dersên li ser dîroka Îslamiyetê, Rojhilata Navîn û siyasetê dane. Niha li NewYorkê Queens Collegeê doçentê alîkar e, di beşa Lêkolînên Rojhilata Navîn û Xebatên Îslamî de xebatên xwe didomîne.

Ji bo Tavge û Jiwana

NAVEROK

DESTPÊK	11
Di dîroknûsiyên fermî de îmaja Kurd	12
HIZRA ÎSLAMÎ YA SIYASÎ YA MODERN, “ÎSLAMÎZM” Û NETEWEPERWERÎ	41
Vejîna îslamî ya modern û peywenda wê ya civakî-dîrokî	42
Îslamîzm, neteweperweriya banal û netewe-dewlet	52
KURD Û ÇÊKIRINA “XWETIYÊN NETEWHEYÎ”	63
Hilatina neteweperweriyên dijber	65
VEJÎNERIYA ÎSLAMÎ Û NETEWEPERWERIYA KURDÎ DI DÎWANA ŞÊX ‘UBEYDULAH DE	83
Hilatina Şêx ‘Ubeydullah û hevîşikestina wî ya ji osmaniyan	83
Kurd beramberî romiyan	88
Projeyek kurdistanî ya vejîneriya îslamî	97
ŞÊXEKÎ KURD Û CÎRANÊN WÎ YÊN XRISTIYAN	107
Gerdûnheziya Şêx a dînî	112
Şêx û perwerdeya kurdan	117
Neteweperwerî û gerdûnheziya dînî ya Şêx	120

VEBÊJEYA DÎNÎ YA SEÎDÊ NÛRSÎ	
DI WARÊ NETEWEYA KURD DE	129
Seîd Nûrsî û tevgerên kurdî yên siyasî	142

EMILANDIN Û ÎSTISMARKIRINA TÊGEHA XELÎFETIYÊ	
Û ŞOREŞA ŞÊX SEÎD	151
Şêx Seîd û Serbaz Xalid Begê Cibranî	154
Şêx Seîd, kemalîst û xelîfetî.....	155
Serhildana Şêx Seîd di dîroknûsiya tirkî ya neteweperwer de	164
Otantîkbûna serhildana Şêx Seîd?	170
Xelîfetiye çî bikin?	176

HÊMAYA KURD DI DÎROKNÛSIYA DEWLETPARÊZ DE;	
MÎNAKA SIMKO	191
Neteweperwerî û Simko	193
Jiyan û siyaseta wî	195
Simko û pevçûnên civatî.....	199
Sunî beramberî şiiyan.....	203
Ber bi serxwebûne ve.....	207
Vebêjeya dewletparêz a berxwedena kurd	209

‘DIPEYIVIM; LOMA EZ ÂDEM IM’:	
DI QUR’ÂNÊ DE MESELEYA ZIMÊN Û BÛYÎNA MIROV	223
Însan li hemberî beşer	224
Bicîkirina Âdem (însan) li ser rûyê erdê.....	225
Ziman, vîna azad û serweriya mirov	237

SPASÎ

Ev xebata li ber destê we berheveke gotarên ku piraniya wan berê bi îngilîzî di kovarên akademîk ên curbicur de û hin ji wan jî di kovara *Zaremayê* de bi kurdî hatine weşandin. Digel ku ev gotar babetên cuda nîqaş dikin jî hemû xelekên zincîrekê ne. Babetên hevpar ev in: îslam, dewleta modern, neteweperwerî, kurd û dîroka kurdan. Bêyî alîkariya mezin a hevala min a xoşewîst Fexriya Adsay ev kitêb wê ne di halê xwe yî niha de bûya. Bo vê xebata wê ya dijarar gelek spasdarê wê me. Adsay li ser wergera van gotaran a ji îngilîzî jî bo kurdî salek zêdetir e dixebite. Miroveke bêwestan e ku bi rastî jî bi çendîn awayan jiyana xwe jî bo xebata li ser dîrok û zimanê kurdan terxan kiriye: Wek nivîskar, wergêr û edîtora kovarê. Û dixwazim minetdariya xwe ji Serdar Şengül û hevalên wî yên Peywendê re pêşkêş bikim jî bo xizmeta wan a ji ziman, wêje û dîroka kurdan re. Hewce nake bê gotin ku ez spasdarê hemû xwendekarên xwe yên li Zanîngeha Artukluyê ya Mêrdînê me ku beşdarî dersên dewra 2014-2015a bûne. Beşdariya wan jî bo min pir girîng bû ku li ser hin babetên ku min di vê pirtûkê de nîqaş kirine bifikirim û bixebitim.

Kamal Soleimani

New York, Tebax, 2018.

DESTPÊK

Ev xebata ku ji nivîsên cuda pêk tê, mijar û temayên curbicur ên derbarê dîroka Kurdistan, îslam û neteweperweriyê de vedikole. Şexsiyetên cuda yên kurd ên dîrokî, wek Şêx Ubeydulahê Nehrî, Seîd Nursî, Şêx Seîd, Îsmail Axayê Simko û rewşenbîrên kurd ên li Stenbolê ji sedsala 19emîn tîr vekolandin. Ev lêkolîn li ber roniya xebateke dirêj a li ser belgeyên dîrokî pêk tîr. Belgeyên li ser van babetan bi riwangeyeke înterdisîplîner tîr vekolandin, ji ber ku nivîskar di lêkolîna xwe de ji teoriyên neteweperweriyê û dîn û analîza gotarê (discourse) sûd girtiye. Wek mînak, Şêx Ubeydulah, vejînerê projeya îslamî a di dawiya sedsala nozdemîn de, bi rêya xwendina berhema wî ya helbestî *Mesnewî an Tuhfetu'l Ehbab* hatiye analîzkirin. Xebata li ser raperîna Îsmail Axayê Şikakî (a.k.a. Simko) ji bîranîn, vegotinên şexsî û hin belgeyên din ên nehatine keşifkirin, îstifade kiriye da ku wêneyekî bêtir tîkel ê raperîna Simko raber bike, hin fikrên giştîqebûl ên derbarê Simko û etno-neteweperweriya wî de problematîze bike û nelihevîyên di lîteratura heyî ya derheqê vî mijarê de derxe meydanê.

Divê ez destnîşan bikim ku dema dor tî ser fehma desthilata dewletê, dijberiyek mezin heye di navbera şexsiyetên dînî yên sedsala 20emîn ên wek Nûrsî û îslamîstên roja me de. Îslamîstên hem-dem, îslam û kontrola desthilata dewletê gelek caran wek heman tiştî dibînin. Loma, ligel neteweperweriya wan a olî, kesên wek Şêx

Ubeydulah, Nûrsî û yê wêk wan divê wêk îslamîst neyê kategorîzekirin. Bi gelek awayan, fehma wan a siyaset, îslam û dewletê ji ya îslamîstên me yê hemdem cuda bû. Bêguman, ew jî berhema paradîgmaya neteweperweriyê bûn. Lê, wan damezirandina dewleteke olî wêk meseleyek esasî ya afirîndeyê mirov nedidîtin. Ji îslamîstên modern cuda, wan wêk dewreke xelîfeyên pîroz li rabirdûya îslamî nedinêrîn ku niha îslamîst bawer dikin vejîna wê tekane rêya xelasiyê ye li her du aleman jî. Digel encamên wê yê pir xirab bo alema îslamî, ev mefhûma nostaljik a xelîfeyê û îslamê pir berbelav e. Lê, digel çewtbaweriyên berbelav, ne Ubeydulah ne Şêx Seîd daxwaza pergala xelîfeyê dikirin. Heta fehma Nûrsî ya xelîfeyê pergaleke îmayî û modern bû ku ji binyadeke esasî bêpar bû.

Di Dîroknûsiyên Fermî de Îmaja Kurd

Ji ber hewldanên çalak ên Komara Tirkiyeyê û Îrana pişt-qaçar ji bo homojenîzekirina dezgeyên neteweyî, her du dewletan jî zedetirî heştê salên bi nerazîbûn û têkoşîna siyasî ya civatên nav xwe yî etno-zimanî yê bindestkirî derbas kirin. Her du dewletan jî hewldanên van civatan ên ji bo bidesxistina mafên xwe wêk gefên li dijî hebûna xwe dîtin. Di vê berhevê de ez ê rehên neteweperweriya kurdî keşif bikim bi çavekî rexneyî ka bê awayekî taybet î homojenîzekirina berhêl-dewlet çawa bandor lê kiriye. Ligel çespendina dewletê û pergala wê ya perwerdehiyê ji bo belavkirina îdeolojiya dewletê û awayên nû yê nasnameyan, nasnameyên di fermiyetê de “nayên-xwestin” dewam kirin, peyda bûn an rêyeke vejînê dîtin.

Bi nerîna min li her du welatan jî modelên manend dikare bê nîşandan. Mixabin tê famkirin ku di piraniya lîteratura neteweperweriya kurdî de vê xala aşîkar têra xwe bal nekişandiye. Piraniya lêkolîneriya heyî di bin bandora fehmeke metacografîk a netewe-dewletên tirk û îranî de ne.¹ Kêmtirîn heta nivê 1920an, ji

1 Li ser şopa Karen Wigen û Martin Lewis, bi metacografîyê qesta min, “komekê binyadên mekanî ne ku mirov di nav wan de dibin xwedî zanîna xwe ya dinyayê, çarçoveyên gelek caran bêhay ên xebatên dîrok, sosyolojî,

bo gelheyên kurd ên Anatoliyaya Rojhilat û Rojavayê Îranê sînor tunebûn û bi rihetî diçûn dihatin an li her du aliyên sînoran jî erdê wan hebûn. Şaşiya mekanî ya lêkolîneriya heyî ji ber periyodîzasyonên zorakî ne ku bi tundî nerîtê ji modernîteyê, împaratoriye ji netewe-dewletê vediqetînin û peydabûna neteweperweriya kurdî ji demajoyeke tevlihev bêtir wek bertekek ji nişka ve pênase dikin. A din, pareke girîng a lîteraturê hatiye seqetkirin ji ber bikaranîna kategorî û nerînên dewletên Tîrkiye û Îranê bêyî ku lê bê fikirîn, nemaze ji aliyê lêkolînerên revîzyonîst ên dîroka kurdî. Di encamê de, dîroknûsiya kurdî, wek formeke xwe-fahmkirina kurd a paşê, gelek zêde di bin bandora fahmên kemalîst û pehleviyên derbarê kurdan de maye. Hêviya min ev e ku hin rengdanên van şaşiyan heyî pêşkêş bikim.

Hevbandoriyên di navbera kurdan û dewletê de dikare bi fi-rehî di nav sê qonaxan de bê dabeşkirin ji çaryeka dawî ya sedsala 19emîn û vir de. Qonaxa yekem rehên wê yên siyasî û çandî di sedsala dirêj a 19emîn (1789-1914) de ne ku him Îran him Tîrkiye ji împaratoriye ber bi netewe-dewletên navendî ve di nav veguherî-neke mezin a civakî-siyasî re derbas bûn ku bi meşrûtiyetxwazî û taliyê bi çaryeka pêşî ya sedsala 20emîn re bi hatina bijareyeke nû ya leşkerî ser desthîlatdariyê berbiçav bû. Li Tîrkiyeyê, qonaxa du-yem hema hema dikare wek serdema yek-partiyê bê bicîkirin. Ev li Tîrkiyeyê dikare navbera 1923 û 1950î de, li Îranê navbera 1925 û 1941ê de bê bicîkirin. Qonaxa sêyem ku di xebata xwe de li ser nase-kinim, ji salên 1940 û 1950î heta xuyakirina projeyên neo-lîberal di salên 1980yî de li Tîrkiyeyê û li Îranê jî heta şoreşa 1979an dewam dike. Dîrokên Îran û Tîrkiyeyê bi gelek awayan dane ser rêyên terîb. Windakirina axê û tîrsa parçebûnê dûre bi gotarên nijadperest ên Ewropî re ketin nav hev. Ev tîkela jehrî ya tîrsê û neteweperweriyên hîm-etnîk bandor kirin li ser xwe-xuyanga van împaratoriyan di destpêka pêşbirka Hêzên Mezin de ku bi giştî wek Lîstika Mezin

antropolojî, aborî, zanista siyasî û heta dîroka tebî'etê organîze dikin." Ji *Myth of the Continents*, r. ix.

û tevgerên xwecîh yên ji bo otonomiyê tê zanîn. Gelek ji siyasetên modernîzekirin û navendîkirinê ku ji aliyê dewleta osmanî ve hatin meşandin paşê ji aliyê qaçaran ve jî hatin meşandin. Wek ku Nader Sohrabi bi îsabet dibêje, “Îran û Împeratoriya Osmanî her du jî di sedsala borî de dîrokeke wan a hevpar a reformên bergirî yên li dijî gefên hundirîn û jeopolîtîk heye.”²

Dilbijandina qaçaran a ji bo siyaseta osmanî, di berhem û nifûza reformîstên mezin ên Îrana sedsala 19emîn ên wek Amir Kabir, Mustashâr al-Dawlah û Mirza Malkam Khan de diyar dibe. Her sê jî demek dirêj li Împeratoriya Osmanî jiyane û dûre di reformên rêveberiya qaçaran de bûne şexsiyetên girîng. Di dawiya sedsala 18emîn de, dema dewleta Osmanî di bin banê Nizam-i Cedîd de dest bi modernîzekirina hêzên xwe yî çekdar kir, di artêşa qaçar de jî derbarê reforman de hewldanên şibîner dest pê kirin. Îtxalata îraniyan a ji osmaniyan û dû re, reform û stratejiyên rêveberiyê ji Komara Tirkiyeyê heta salên 1940î dikare bê dîtin.

Di Împeratoriya Osmanî de, di sala 1902yan de, rêxistineke bêtir radîkal Îtîhadî Terakî û Pêşketinê (ÎTP) peyda bû ku heta 1923yan, nerînên xwe yên siyasî, çandî û îdeolojîk wek hîmê Komara Tirkiyeyê saz kir. Li aliyê din, li Îranê nerazîbûna nav gel a ji rêveberiya qaçaran û tecawizên emperyal rê li ber Şoreşa Meşrûtiyetê ya Îranê (1906-1911) û taliyê jî di sala 1925an de li ber desthilata Pehlevî vekir. Rejîma monarşîk a Riza Pehlevî bi awayekî eşkere xweziya xwe bi gelek siyasetên Mustafa Kemal anî. Li her du dewletan, pêkhî-nana gef û raperînên hundirîn ên di vê serdema dirûvdanê de zêde bûn û îdeolojiyên radîkal ên neteweperwer ên etnîk derxistin pêş.

Dewleta tirk, piştî jiholêrakirin û tunekirina gelheya xwe ya ermen, hewcedarî pê dît ku wek gefeke din a muhtemel li dijî yekitiya neteweyê, bi kurdan re elaqedar bibe. Gelheya kurd ji aliyê siyasî, civakî û erdnîgarî ve parçebûyî bû, nikaribû wek gewdeyekî yekbûyî bi dewletê re têketa pêşbirkê. Bi ser de, gelheya kurd tirsiyabû

2 Nader Sohrabi, *Revolution and Constitutionalism in the Ottoman Empire and Iran* (Cambridge University Press, li ber çapê ye), r 29.

ji ihtimala ku makîneya dewletê ya berê xwe dabû cîranên wan ên xristiyan, niha berê xwe bide wan –ev rastiyeke e ku şexsên wek Şêx Ubeydulah di wexteke zû de 1880yî de lê hay bûbûn. Li Îranê çalakîyên siyasî yên kurd (li Sinê û Kirmanşanê) ên destpêkê de ne ewqas zêde lê ihtimala Simko³ û çalakîyên wî yên xweser bêtir bala dewletê dikişand. Navbera 1912 û 1928an de, Simko dibistan, rojnameyek bi zimanê kurdî damezirand, li herêma xwe zimanê kurdî kir zimanê fermî û bi fikra Kurdistanê serbixwe ve radibû (bnr., beşa 8.). Ev qonaxa li jor hîmê dewletê û li hember wê hîmê vegotina dijber a etno-neteweperwer a kurdî danî (bnr., beşa 3.). Piştî vê, qonaxa duyem hat ku dewletan, her çiqas îdeolojî û projeyên lihev tunebin jî, cehd kirin şirkatîyên terîtoriyal û siyasî çêbikin ku kurd li dij derdiketin. Her du dewletan hêza xwe ya leşkerî, aborî, bisazî û çandî/perwerdehî seferber dikirin ku projeya homojenîzekirinê pêk bînin, aliyê kurdan jî bêyî şiyana bikaranîna potansiyela xwe ya hundirîn û bidestxistina piştgiriya derveyî dem bi dem bertek nîşan didan. Tunebûna rewşenbîrên organîk dikare wek mezintirîn kêmasî bê dîtîna di bertekên kurdan de li hemberî projeyên neteweperest ên li Îran û Tirkiyeyê. Ev qonax li Tirkiyeyê bi damezrandina komara Tirkiyeyê û li Îranê jî bi destpêka hukumdariya xanedana Pehlevî derdikeve pêş ku her du dewletan di aleyhê civatên etnîk ên bindest de bi hêviya tunekirina hemû cudatîyên çandî û etnîk projeya xwe ya homojenîzekirina siyasî pêk anîn û qada siyasî heta bêje teng û vederker kirin. Dewletan peywira yekdengkirina gelê xwe da ser xwe ku di pratîkê de di nav sînorên xwe yî terîtoriyal de bi afirandina êdinên-nayên-xwestin encam da. Di peywenda Tirkiyeyê de, vê li gor pîvanên ewlehiya dewletê rê li ber dewama jîholêrakirina fizîkî û bêçîkirina gelheyên etnîk vekir.

Qonaxa sêyem ku li derveyî vê pirtûkê ye, li Îranê dikare di dawîya qewirandina Riza Şah a ji Îranê ya di 1940î de û li Tirkiyeyê piştî têkçûna Partiya Gelê Komarxwaz di destpêka salên 1950î de bê bicî-

3 Serokê eşîra Şîkak a li dora Gola Urmîyê, di navbera salên 1912-1928a de li herêma hêzeke desthilat bû. Piştî Yekem Şerê Cîhanê bêtir bi awayekî eşkere qala serxwebûna kurdan dikir.

kirin. Li Tirkiyeyê pirsra kurd piranî di nav têgehên paşdemayîbûn, dîndarî û eşîrîbûna kurdan de hat nîqaşkirin û wek paşdemayîbûna herêmî û neserkeftîbûna medenîkirin û entegrekirina bi aboriya neteweyî û bazarê hate nîşandan. Li Îranê, piştî hukumdariya Riza Şah fetreta Musadiq, Komara Mahabadê hat û dûre têkiliyek bêîstiqrar a bi Iraqa cîran û dewletên din ên ereb ku hemûyan kir ku dewlet siyaseta xwe ya kurdî ji nû ve dirust bike. Jê şûn de, navê kurd wek parçeyek ji nasnameya Îrana jinûve-ava hat îlankirin û wek kurên Îranê yên esîl (*asiltarin farzand-e Iran*) û piştîmêrên sînorên welêt (*marzdaran*) hatin binavkirin.

Di nav vê tora hevbandoriyên navbera dewlet û kurdan de, yek ji babetên girîng ku jê re lêkolîn lazim e, dirûvdayîna dîroknûsiya dewletparêz a ji bo kurdbûn û manîfestoyên wê yên siyasî ye. Veşartina nasnameya kurd a ji aliyê dewletê ve bi awayên curbicur tê pênasekirin û her lêkolîner mijarê li gor qada xwe îzeh dike. Wek mînak, Abbas Vali, zanyarê siyasî, hemû hevbandoriya navbera dewlet û kurdan wek “diyalektîka berxwedan û înkare” pênasê dike. Bi nêrîna wî, ev diyalektîk e ku “awayê polîtîk û karakterê neteweperweriya kurdî pênasê dike.”⁴ Di vê xwendinê de, înkara berdewam a nasnameya kurd ji aliyê dewletê ve neteweperweriya kurdî çêkiriye wek teyîdkirina nasnameya wan. Li gor Vali, înkara dewletê ya nasnameya kurd sedema mezin a înkara mafên sîvîl e. Siyaseta dewletê ne tenê vederker û bi tundî çespîner e li hember “Êdin” û êdîniya kurd, lê li hember hebûna Êdin bixwe ye jî. Valî îdia dike, vê înkare rê li ber parçebûna neteweperweriya kurdî vekiriye. Ev bêtir ji ber vê ye ku pêşqebûla sînorên dewleta niha bi xwe wek xwezayî tê dîtin. Ev fikir dikare bê dîtin di bikaranîna çarçove û kategoriyên ku dewlet bi muxalefeta siyasî ya dijî dewletê dide pejirandin û ji aliyê gelek akademîsyenên kurd ve tê emilandin. Bi vê çendê, ev kirina “înkare û netemsîlkirin” a kurdan xwezaya neteweperwerî(yên) kurd û binyada têkiliya wan a bi Êdin re jî tayîn

4 Abbas Vali, “The Kurds and Their ‘Others’: Fragmented Identity and Fragmented Politics” di nav *The Kurds: Nationalism and Politics*, ed. Faleh A. Jabar û Hosham Dawod (London; San Francisco: Saqi, 2006), r. 49.

dike.⁵ Lê, li Tirkiye û Îranê dewlet bi awayekî cuda kar dike. Li Tirkiyeyê dewlet dibêje kurd “tirkên çiyayî” ne û nasnameya kurdbûnê îcadeke propagandaya Rojava ya dema şer e. Li Îranê, înkara kurdbûnê bi awayekî gelekî cuda dişuxule û gelek caran bi îdeolojiya aryanîzmê ya pala xwe daye-dewletê û şopên şîtiyê ketiye nav, di nav têkiliyê de ye. Ev stratejiyên nû yên înkare bûn sedema manîfestoyên cuda yên neteweperweriya kurdî û wiha tevkariya binyada wan a parçebûyî û teng/sînordar kirin.

Sosyologê tirk İsmail Beşikci ku berhemên wî rengdanên kûr ên dema xizmeta leşkeriya wî ya li herêma kurdan in, gelek mînakên dîrokî, zagonî, siyasî û çandî anîne ba hev ku wek delîlên projeya dewletê ya dîrûdirêj ji bo veşartin û şaştemsîliyeta nasnameya kurd tên dîtin. Bi zanîna min, ew yekem akademîsyen e ku Kurdistan wek bituneke mêtinkirî dîtiye û rewşa kurdan wek rewşeke bi ya neteweyên mêtinkirî miqayeseyî yan ji ya wan xirabtir lêkolaye.⁶ Beşikci dide ser şopên veşartina sazûmanî ya nasnameya kurd di yekem makezagona komarê de wek delîlên sereke yên “tahrîfata sazûmanî”. Beşikci diyar dike ji ber ku makezagon “hewl dide meseleyeke sosyolojîk bi amrazên îdeolojîk çareser bike, [...] li gor makezagona 1924an her kesê li Tirkiyeyê dijî wek etnîk tirk e û bi ser de bi tirkbûnê kêfxweş e.”⁷ Makezagon li aliyekî dibêje her kes ji tirkbûnê kêfxweş e û li aliyekî din jî hebûna hêmanên ne-tirk ên di nav sînorên Tirkiyeyê de înkare dike. Lê, di makezagonê de tirk-bûn him dibe mueyîdeya-dewletê, etnîsîteya fermî û him dibe tercîheke şexsî. Bi vê îlana zagonî, welatîyên di nav sînorên siyasî yên Tirkiyeyê de bi nasnameyê yekgirtî hatine bexşkirin an bi nasnameyê yekgirtî hatine naskirin; dixwaze ev welatî ji nasnameya fermî razî bin dixwaze ne razî bin. Beşikci vê merckirina badayî wek îfadeyêke îdeolojîk ku ser realîteya civakî ya hebûna hêmanên ne-

5 B.n.b., rr.49-55. Û ———, “Wki Conflict Resolution Forum “ (1998).

6 İsmail Beşikci, *Devletlerarası Sömürge Kürdistan*, Bilimsel Araştırma Kitabı (Bonn: Weşanên Rewşen, 1990), r. 8.

7 ———, M. Kemal Atatürk, *Unesco & Destruction of Kurdish Identity in Turkey* (Croydon Park, N.S.W.: Committee for Decolonization of Kurdistan, 1986).

tirk dinixumîne dibîne. Bêyî ku bêje di nav mehên ev makezagon dihate amadekirin de, Tîrkiye bû şahidê berfirehtirîn serhildanên heta wê demê.

Li gor Beşikci, jêbirina kurd û Kurdistanê ji lîteraturê û di makezagonê de tunehesibandina wan qaîdeya sereke ya dewleta tirk û îdeolojiya wê ye. Wê “wek îdeolojiya li ser derewan ava bûye” bi nav dike, wek ji filê re bêjin ‘ev dar e.’⁸ Beşikci diyar dike, “înkara makezagonî ya nasnameya kurd û tirkîfizekirin bû esasê şertên zagonî yê newekhev ku ji bo kurdekî bêîmkan dibe tê de wek welatîyekî tam bijî. Di xwendina wî de, ev şert pêwîst dikin qebûla raserbûna etnîseteya tirk ji aliyê her kesê di nav sînorên Tîrkiyeyê de dijîn. Beşikci bawer dike him makezagona 1924a him a 1961ê şênberbûna îlana raserbûna etnîsîteya tirk e, ji ber ku qebûla vê raserbûnê pêşmercê şansê tirkbûnê bû.”⁹

Beşikci, ji bo şideta înkara nasnameya kurd dest nîşan bike, rewşa kurdan bi qonaxa pêşdeçûyî ya xulamtiyê re dide ber hev. Hewl dide vê angaştê xwe bi bidestxistina derûnî û felsefî ya nasnameyê ya balkêş palpişt bike. Angaşt dike ger yek li ser bê ferzkirin ku nasnameya xwe înkare bike yan veşêre, ew xulam e heta di hiyerarşîya dewletê de di bilindtirîn pozîsyona siyasî yan leşkerî de be jî. Her wîha, hîç kurdek nikare di dewletê de xwedî pozîsyon be bêyî ku teslîmî zordariya sazûmanî ya xwe-înkare û veşartinê bibe. Nasnameya kurd, nasnameyê derzagonî ye û ev pratîka înkarkirina nasnameya kurd hatiye bisazîkirin. Diyar dike her yek sazî, wek zanîngeh, partiyên siyasî, darêzgerî û çapemenî angaşt dikin “li Tîrkiyeyê her kes tirk e [çi destê wan tê dikin] ku realîteya kurd bidarizînin.”¹⁰ Beşikci red dike ku fikra vederkirina nasnameya kurd tenê berhema projeya modernîzekirina dewletê ye ji ber binyada wê ya “eşîrî û dînî”. Lê, di riwangeya Beşikci de ev zelal e ku ber-

8 Ismail Beşikci, *M. Kemal Atatürk, Unesco & Destruction of Kurdish Identity in Turkey* (Croydon Park, N.S.W.: Committee for Decolonization of Kurdistan, 1986), r. 9.

9 B.n.b., rr. 13-14.

10 B.n.b., rr. 15-17.

terefkirina qada zagonî û siyasî ji zexta dewletê ya li ser jirêderketiyan ku bi hêmanên “qaçaxçîfî, haydûdî, eşîrî û paşverûtiya siyasî”, asta ku gotara dewletê nasnameya kurdî dadixistê, wêdetir diçe. Bi nêrîna wî, her heybereke ku îşaretî ne-yekjimariya çand û etnîsîteya dewletê bike, ew derzagonî ye. Ev di madeya 89emîn a zagona cezayê ya Tirkiyeyê de ya derbarê partiyên siyasî û girtina wan de jî tê îzehkirin ger partî çeşîtdariya siyaseta Tirkiyeyê îma bikin an, yek-çandî yan yek-etnîsîteya wê bidin ber pirsan. Di xwendina wî de, wek mînak zagona cezayê ya 1966an hemû îhtimalên pejirandina welatîyên ne-tirk ji holê radike. Ev zagon zemînê zagonî peyda dike ji bo xeniqandina partî yan komeleyên îtiraf bikin ku “li Komara Tirkiyeyê komên kêmar ên ji cudatîyên etnîk, olî, çandî pêk tên hene [...]”¹¹

Mesut Yeğen bi heq dest nîşan dike ku “bi her awayên lênêrînên li Gotara Dewleta Tirk (GDT) a hemdem diyar dike ku dewleta tirk, demeke dirêj e, bi dewamî rê li ber naskirina kurdbûna meseleya kurd girîtiye.”¹² Him gotara dewletê him dîroknûsiya fermî bêdil in kurdbûnê îlan bikin. Kurdbûn bi gelemperî wek xwenîşandana eşîrî, qaçaxî, haydûdî û paşverûbûna olî yan “kevneperestiya siyasî” tê raberkirin. Bi giştî, dîroknûsiya fermî, nasnameya kurdî wek ji xwe pêş-modern û li ber dewletê ku aktora modernîzekirinê ye, asteng dihesibîne. Ji ber vê çendê, dîroknûsiya dewletparêz çarçoveya kurdbûnê wek pevçûna di navbera pêş-modern û modern de xêz dike. Nasnameya kurdî wek temama paşverûbûn (*irtica*)¹³, eşîrî, haydûdî û qaçaxî yan “aboriya perîferiyê” hate dîtin. Ji ber ku di gotara fermî de, hêmanên etnîk, çandî û zimanî yên şêniyan hatibû

11 Beşikçi, M. Kemal Atatürk, *Unesco & Destruction of Kurdish Identity in Turkey*, r.13.

12 Min nikaribû li teza wî (bi îngilîzî) û nivîsên wî yê din î bi tirkî binerim û loma min xwe piranî spart ev du gotarên wî: Mesut Yeğen, “The Turkish State Discourse and the Exclusion of Kurdish Identity,” *Middle Eastern Studies* 32, no. 2 (1996). Mesut Yeğen, “The Kurdish Question in Turkish State Discourse,” *Journal of Contemporary History* 34, no. 4 (1999).

13 Bi tirkî *irtica*, bi farişî *irtija*, bi erebî *rij'iya*, bi îngilîzî, bi awayê ku Yeğen wergerandiye, *retrogression*, *backwardness* an *political reactionism*.

piştguhkirin, herêma kurdan ji ber vê binyada civakî ya vederker ku neyarê modernîteyê ye, bû herêma mehkûmbûyî. Dewlet, wek aktora modernîteyê mecbûr dibe serî li tedbîrên zorlêker bide da ku ev hêmanên wek astengên li ber modernîteyê ji holê rake.

Xebatên li ser gotarê ji bo gotara dewletê û bandora wê ya li ser sazkirin an berdewamkirina kategoriyên gotarî ji hev bixe/ji hev belav bike tên dîzaynkirin, ji ber ku “... gotar dikare xizmeta saz-kirina kategoriyên wek ‘nijad’, ‘netewe’, ‘etnîsîte’ û ‘welatî’ bike û heta dikare parçe bike yan hilweşîne.”¹⁴ Analîza gotarê di sîplîneke ziman(ên)ê hatiye bêdengkirin û wechên kêmkar ên gotarê eşkere dike da ku di hilberîna zanînê de bandora desthilatê û awayên ku koma serdest pê tê temsîlkirin û bûyerekê bi çarçove dike ronî bike. Ev ji bo jihevixistina binyada dîskrîmînatîf a pêvajoyê ye ku bûyerek tê de tê sazkirin û realîteyên civakî-siyasî li gor pêwîstî û hewce-dariyên desthilata çespîner maqûl tê raberkirin. Ger analîzên bi vî awayî tiştê ku ji xwe gotara serdest berê hilberandibû hilberîne, di xebata li ser gotara dewletê de serkeftineke zêde çênabe.

Dem a gotara medenîkirinê qaîdeya jîholêrakirina êdiniyê be ku di nakokiya kurd/dewletê de rewş ev e, hedefa gotarê rewakirin û veşartin e. Ew veşartin e ji ber ku hedefa beyankirî şaş e. Hedef asîmîlekirin e yan tunekirina wan hêmanan e ku ji desthilata hegemonîk re wek asteng tînin dîtin. Lê, peywîreke wisa xedar tevî çarçoveyeke guncav bi eşkereyî kirina xwe rew a dike û ji bo dewamkirina peywîra xwe desteka lazîm e peyda dike. Loma, şeytanîkirina êdînerkek wê dualî heye ku di heman demê de him realîteya êdînerkek wê vedîşêre him xedariya yê serdest rew a dike. Wek ku berê hat destnîşankirin, jinûvesazkirin an jinûveçêkirin ne termên notr in. Çaxê desthilata mêtînger hebûn an nasnameya bindestan ji nû ve çêdikin, jinûveçêkirina pêk tê realîteya bindestan temsîl nake lê wê çeloxwarî dike. Îhtîmala herî baş, ev jinûveçêkirin nivê çîrokê dibêje. Koma bindest bi awayekî ku însaniyeta wan xuya neke û sûcên koma serdest bê rewakirin tînin temsîlkirin, tê guhertin û şikil tê

14 Blackledge, *Discourse and Power in a Multilingual World*.

dayîn. Ev ne ew e ku Said wek mîsyona oryentalîstan pênase kiriye: qeweta rewakirinê ya li pişt mêtîngiriyê? Jinûveçêkirina êdinê ku hatiye-şeytanîkirin hemû bawerî û rawêjên (assumptions) ku lazimiyên îdeolojîk in bo sernixumandina hebûna êdin û lêpîrsîna yê nerewa dihewîne. Seba vê, xebata li ser gotara hegemonîk û pejirandina karakterîzasyonê wê ya ji bo reqîbên xwe bi problem e. Gotareke diyar a siyasî ji bo bûyerên rabirdûyê bi awayekî rast ragihîne ji nû ve çênake yan ji nû ve saz nake. "... [Jinûve]sazkirina bûyerên rabirdûyê, bawerî û rawêjan, wek ku em angaşt dikin, hîmên îdeolojîk û siyasî yê hewce dabîn kirine ku hevsengiya desthilata duzimanî (diglossic) [mîsal, împatoriya Habsburg an Tirkîye] û veguherîna wê ya nîhayî li ser hatiye hilberandin, qewîkirin û taliya talî, hatiye rewakirin."¹⁵

Yek aliyên kê mên xebatên fermî yan ên bi awayekî fermî hatine tesdîqkirin, guhnedana wan a bo qedexeya zimanê kurdî û çavlêgirtina wan li zimên wek parçeyek nasnameya kurdî ye. Ziman bi gelemperî ne tenê yek ji parçeyên girîngtirîn ên nasnameya etnîk û wek taybet jî ya etno-neteweperweriya kurdî ye, ew bûye yek ji babetên ku ji 1870yî vir ve, him dewlet (ên Tirkîye û Îran) him rewşenbîr nikarin bêyî wî bikin. Rewşenbîrên wek Akhondov, Malcolm Khan û gelekên din ziman wek gaveke sereke ya ber bi modernîzasyon, destpêka burokrasiya modern û talî ya dewleteke xurt dîtî. Kêmtirîn ji çaryeka dawîn a sedsala 19emîn vir ve, safîkirina zimanên tirkî û farisî, tevî hin navberan, wek peywîrê hatiye qebûlkirin. Di sedsala 20emîn de reforma zimên di peywenda dewletên him Tirkîye him Îranê de muhtelabûna dewletê bû. Him li Tirkîye him li Îranê reforma zimên bû projeyek mezin a dewletê wek parçeyek ji peywîra modernîst û neteweperwer bo raserî û reseniya zimanên xwe vejînin ku her duyan jî –bi “teoriyên Roj Ziman”- angaşt dikirin maka hemû zimanan in.

15 Rosita Rindler Schjerve, *Diglossia and Power: Language Policies and Practice in the 19th Century Habsburg Empire, Language, Power, and Social Process* 9 (Berlin ; New York: Mouton de Gruyter, 2003), r. 37.

Girîngîpêdana zimanê kurdî¹⁶ di sedsala 18emîn de bi berhema Ehmedê Xanî dest pê kiribû. Şair û nivîskarê kurd ku digot wî nivîsîna bi kurdî tercîhî navdariyê kiriye ku ya na wê bi nivîsîna bi erebî û farisî ev navdarî bi dest bixista. Tê zanîn, hin ji berhemên Xanî di medreseyên kurdî de dihatin fêrkirin.¹⁷ Teşebîsên zimanî yên bi vî rengî ji aliyê Hacı Qadirê Koyî, şairê sedsala 19emîn û ustadê malbata çalakger a Bedirxaniyên weşangerên yekem rojnameya kurd di dawiya sedsala 19emîn de, hate xurtkirin.

Ligel têkiliya navbera zimên û hilatina neteweperweriyê û bandora jehrîn a filolojîyê, Kushner balê dikişîne sedemeke din a girîng bo axaftinên zimanî yên obsesîv ên rewşenbîrên osmanî. Destnîşan dike ku ji ber sensura li ser nîqaşên siyasî, komên xwende bi taybetî hewesa xwe berdan ser xebatên zimanî û edebî.¹⁸ Girîngîpêdaneke mezin hebû ji aliye rewşenbîran ve, ji bo pêwendiya heyatî ya navbera ziman û netewetiyê de. Gelek îdiayên curbicur hebûn ji aliyê rewşenbîrên kurd ku diyar dikirin, ger yek nikaribe bi zimanê xwe rabigihîne, ew ê ji desthilatdariya siyasî û girtina biryaran bê dûrxistin. Wek mînak, rewşenbîrekî kurd Bâban nivîsandiyê, “esasê rizgariya neteweyekê ne ya neteweyî ye lê perwerdehî ye. Mifteya perwerdehiyê ziman e. Deriyê şaristaniyê wê

16 Li vir, ez hewl didim dîroka nîqaşên derheqê zimên dupat bikim. Divê neyê wê maneyê ez ikna bûme ku Neteweperweriya kurdî beriya salên dawî yên 1870yan hebûye.

17 Li gor *Today's Zaman*, heta 2/28/98an li medreseyan fêrkirina zimanê kurdî he jî bi awayekî mumkin bû. Ev tarîx bi midaxeleya leşkerî ya bo hikumeta sivil tê zanîn ku artêşê bi bikaranîna imtiyaza xwe ya makezagonî, serokwezîrê wê demê Erbakan mecbûrkirin derqanûnîbûna nixumandina jinan li daîreyên fermî îmze bike. Li Tirkîyeyê ev midaxele wek 28 *Şubat Süreci*/Demajoya 28ê Sibata tê zanîn; destpêka demajoyeke nû nîşan dike ku di siyaseta Tirkîyeyê de awayekî nû yê midaxeleya leşkerî dest pê kiribû (*Today's Zaman*, 2/ 28/2010 < <http://www.todayszaman.com/tz-web/arsivSonuc.do>). Xuya ye û ligel ku dem bi dem qut bûbe jî, li herêma kurd li medreseyan fêrkirin her tim bi kurdî bûye.

18 Wek mînak bnr.; *David Kushner, The Rise of Turkish Nationalism, 1876-1908* (London ; Totowa, N.J.: Cass, 1977), rr. 13-16.

bi vê miftê bê vekirin.”¹⁹ Girîngiya zimanê kurdî di berhemên alimê olî Bedîuzeman Mela Seîdê Kurdî, an Nursî de jî tê destnîşankirin ku dibêje “bi kurdî difikirim lê lazim e bi erebî û tirkiya ku daktîloya te-xeyula min nikare fikrên min veguhêzîne, binivîsinim (Bnr., beşa 7).”²⁰

Dema polîtîkayên zimên ên dewletê di nav vê peywendê de tîn bicîkin, ev dike ku mirov fam bike qedexeyeke ewqas hişk û keyfî divê bûbe xwedî bandorek katalîzator di tahrîkkirina civatê û guherîna etno-neteweperweriya wan a ku îhtimal heye bêbiryar bûya de. Loma akademîsyenên modernîst ên neteweperweriyê vê qedexeya zimanî ya ji nişka ve wek baştirîn amraz dibînin bo bijarteyan ku propagandaya “projeya xwe ya ji jor ber bi jêr ve” bikin û mesafeya navbera xwe û girseyan ji holê rakin da ku projeya xwe ya neteweperwer bidin meşandin. Her du dewlet jî di berbiçavbûna etno-neteweperwerbûna rola zimên de ne îhmalkar bûn. Ziman qada reqabeta neteweperweriyê bû û wek baştirîn qada lawazkirina hebûna Êdîn dihate dîtin. Di peywenda Tirkiyeyê de ji 1876an vir de, tirkî wek zimanê fermî hat pejirandin ku bi hukumdariya Abdulhamid ê bi “pan-Îslamîzm”ê tê naskirin, dest pê kir.²¹

Ger mirov li ser xwedîlêderketina bi israra Abdulhamid bo nasnameya olî ya Împeratoriye bifikire, ev israra li ser zimên bêyî fikirîna li ser dahatûyê nikare bê kirin. Bo misilmanan zimanê fêrkirinê tirkî bû û dewletê destûr nedida zimanên din ji bo fêrkirinê bîlandin. Wek ku hat raberkirin, dewleta nû ya Pehlewî û Komara Tirkiyeyê siyaseta wan a zimên projeyeke eşkere bû ji bo tehliyêkirina zimanên din ji qada giştî. Bi qewlê Houston, bi vî awayî wan armanc dikirin zimanên ne-serdest têxin halê “heteroglossia (pirzimanî)” ku bi wan zimanan êdî nikare bê fikirîn an “texeyulkirin.”²² Qedexeya zimên a

19 Martin Strohmeier, “Crucial Images in the Presentation of a Kurdish National Identity: Heroes and Patriots, Traitors and Foes, Social, Economic, and Political” *Studies of the Middle East and Asia*, (Leiden; Boston: Brill, 2003), r. 40.

20 Saîd Nursî, *İçtimâî Reçeteler-I*, 5.

21 Bnr. Kamal Soleimani, *Islam and Competing Nationalisms in the Middle East, 1876-1926*.

22 Christopher Houston, *Kurdistan: Crafting of National Selves* (Bloomington, Ind.: Indiana University Press, 2008).

sala 1924an yek ji xurttirîn biryaran bû derheqê tekbûna (singularity) awayê hukimkirinê de. Neqanûnîkirina emilandina zimanê kurdî rê li ber neqanûnîbûna her daxwaza piratiya (plurality) şiklê rêveberinê vekir û di bin hukmê netewe-dewletê de îroniya “rewşa mirovî” da destpêkirin. Di vegotina Beşikci ya vê îroniyê de, bi hezaran kurd ji ber neaxaftina tirkî dihatin darizandin lê ji bo nikaribûn bi tirkî bipeyivin, dadgehane wergerên kurd/tirkî digirtin bo wan.

Temayek din a tê tekrarkirin di gotara dewletparêz û dîroknûsiya fermî de “eşîrtî” ye. Hewce nake bê gotin ku du gotarên naxosbar di navbera 1908 û 1924an de ji aliyê ÎTP û dewama wê ya Kemalîst hate pêşkêşkirin. Gotara dewletê ya qada giştî cudabûna nasnameya kurd pejirand û qe ne bi awayê teorîk, li ser esasê bratiya îslamî hevrebûna kurd/tirkan a bi dilxwazî destek kir. Ji ber vê çendê, di 1922yan de, [bi navê] *Özerk Yönetimler*, pêşnûmayek zagonî ya li ser esasê etnîk hat parlamentoyê. Gotara duyem bêtir taybet bû û li derdorên ÎTP û Kemalîst baştir hat propagandakirin. Vê gotarê bijarteya leşkerî wek pêşengê bicîanîna rola arastekirina “netewe”yê didît ku wê ber bi bituneke tek a homojenkirî bajo bi îmtiyazkirina tirkbûnê û kengî derfet çêbû, bi asimilekirina yên din. Bi taybetî ji 1918an heta 1923yan seba sedemên derveyî û hundirîn, gotara yekem gotara serdest a dewletê bû. Di vê serdemê de serxwebûna kurdan, wek ku di peymanê Sevrê de hat merckirin, îhtimalek bû, Împeratoriya Osmanî/Tirkiye bi gefên derveyî rû bi rû dibû û meseleya Misulê neçareserkirî mabû. Di rewşeke wiha de kurd hêzek bûn ku lazim e hesabê wan bihata kirin. Tevî vê, xebatên dema dawî civakeke kurd, ji ya ku gotara Kemalîst dûre tesvîr kiriye, bêtir enerjîk û têkel radixin ber çavan. Heta îdiayên derbarê hebûna jinên kurd ên femînîst li Stenbola destpêka sedesala 20emîn de hene. Bi elaqeya bi hunerên modern û muzîk an bi hobyên wek lêxistina piyanoyê tîr naskirin.²³ Ev “modeya nû ya Stenbolê”, li malê hebûna piyanoyekê bêtir bal dikişîne dema ev

23 Wek mînak bnr.: Rohat Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri*, 1453-1925, ç.1., İstanbul: Avesta, 1998).

li mala Simko²⁴ jî tê dîtin ku dîrokên fermî ji kuştin û talankirinê pê ve qala tişteki wî nakin.

Komek şexsiyetên kurd ên girîng ku ji rêya ÎTPyê veqetiyabûn piştî Şoreşa 1908an angaşt dikirin ku alîkariya ji bo dewleteke kurd zarûriyeteke exlaqî ye bo tirkan. Argumentên bi vî awayî xwe dispartin nerîna dîrokê ya revizyonîst/neteweperwer ku hewl dida rabirdûya dûr jî bike neteweyî. Dihate angaştîkirin, di sedsala 16emîn de kurdan rêveberiya osmanî bi dilxwazî qebûl kirine. Lê, seba ku di dewra netewe-dewletê de dijiyan û kurd xwediyê hemû çawanîyên neteweyekê bûn, dihat gotin, pêwîst e di avakirina dewleta xwe de alîkariya wan bê kirin.²⁵ Him rewşenbîr him pêşengên civatê hay ji gotara nû-ava ya diyarkirina pêşeroja xwe hebûn û hewl didan vê di lehê kurdan de bi kar bînin. Tê gotin li Silêmaniyê Şêx Mehmûd Berzencî kopiyek 14 Madeyên Wilson her tim bi xwe re digêrand û bo daxwaza serxwebûna kurd rewa bike ew wek referans nîşan dida. Yek ji pêşengên Koçgiriye li pêş Mustafa Kemal madeyên Wilson referans dabû wek rewakirina daxwazeke wiha ku Mustafa Kemal di kongreyên Erzirom (1918) û Sêwazê (1919) de soz dabû kurdan.

Delîlên dîrokî nîşan didin ku bilêvkirina peyv an gotinên wek “miletê kurd” kesên wek Mustafa Kemal bi xwe jî neditirsand. Di sala 1920î de, heftê û pênc endamên kurd hebûn ku wek *Kurdistan Mebuslan* dihatin zanîn di nav mebûsên osmanî yê di parlamentoyê de. Serokê parlamentoyê Seyîd Abdulqadir, kurê Şêx Ubeydu-lahê Nehrî (bnr. beşa 4.) yê pêşengê neteweperweriya kurdî di dawîya sedsala 19emîn de jî di nav wan de bû. Mustafa Kemal bi xwe ev mebûs teşwîq dikirin ku bi cil û bergên kurdî werin parlamentoyê. Bi awayekî îronîk, yek ji wan tenê pênc sal şûn de ji aliyê Dadgeha Îstiqlalê ya Diyarbekirê ve seba cil û bergên kurdî hat daliqandin.

24 Chris. Kutschera, *Mêjûy Kurd Le Sedey 19-20 Da*, wer. Muhammad Rayyani (Taran: Sadaf, 1369/1990).

25 *Jîn*, no. 3, 1918 bi awayê li vir hatiye nîşandan: Strohmeier, “Crucial Images in the Presentation of a Kurdish National Identity: Heroes and Patriots, Traitors and Foes”, r. 26.

Gotinên wek du millet, tirk û kurd, gelek caran li pêş Mustafa Kemal li parlamentoyê hatine bilêvkirin. “Ev welat [Tirkiye] yê kurd û tirkan e û tenê milletên kurd û tirk xwediyê vê kursiyê [parlamento] ne.” tekrar tekrar hatiye gotin. Ev axaftin ne wek êrişeke eşîrî ne jî provokatîv hatine îlankirin. Ev, di navbera piştî Şerê Cîhanê yê Yekem û 1923 Peymana Lozanê de gotara gelemperî bû ku ne kurdbûn bi eşîrbûnê re dikir yek ne jî oldariya kurdan wek tiştêkî ji dawiya mayî ya Anadolîyan cuda didît.’ Di parlamentoya osmanî de, Mustafa Kemal biryara kurd û tirkan a bihevremayînê di nav heman sînoran de wek tercîheke “... jiyîna bihevre [û wek] yekitiya jidil (*içtenlikle*) li ser esasê oldariya wan (*dine dayalı birlikleri vardır*)” pêname dikir.²⁶

Di 1922yan de ev rewş ji hundir ve û navneteweyî ve guherî û ji bo kurdan xirab ket. Berovajî peymana berê, peymana Lozanê li ser meseleya kurd bi temamî bêdeng bû. Kemalîstan nehiştin mixalîfên wan ên sereke vegerin Tirkiyeyê yan piraniya reqîbên nav artêşê û derveyî artêşê paqij kirin. Berê xwe dabûn Musilê ku dev jê berdî û hêdî hêdî ji hemû gefên derveyî xilas dibûn. Wek pirsgirêk tenê kurdên bêbiryar û ji stratejiyeyeke lihev a ji bo bidestxistina serxwebûnê bêpar mabûn. Her wiha, Kemalîstan qewlên xwe yî dabûn kurdan neanîn cî û heta di sala 1924an de axaftina bi kurdî qedexa kirin. Di 1925an de plana koçberiya mecbûrî û hewldanên ji bo guherîna demografiya herême li ser navê şerê bi feodalîzm û jinûveparvekirina axê (land reform) bi pêş xistin. Li gor qanûna Projeya Islahata Rojhilat (*Şark Islahat Planı*) û Sazkirina Nîzamê (*Takrîrî Sukûn*), hewl dan hemû malbatên kurd ku wek potansiyel bi talûke ne ji ciyên wan dûr bixin û malbatên tirk bînin dewsa wan. (Bnr. Pirtûka Mehmet Bayrak)

Kemalîst vedigeriya ser kokên xwe yî îdeoljîk ên ÎTPê an ew ji raya giştî re teşhîr dikirin. Îdeolojiya ÎTPê di nav xwe de milîtarîst/elîtîst, li hember gelê asayî jî neteweperwer bû û ew biçûk didît; yên ne elît wek afirîndeyên ji şexsiyeta ferdî (*ferd-i şahsiyet*) û hes-ta takekesîtiyê bêpar dihatin qebûlkirin. Li gor îdeolojiya Kemalîst,

26 Ömer Agin, *Kürtler, Kemalizm ve Tkp* (İstanbul: VS, 2006), r.115.

“eşîr” ne tenê kategoriyeke civakî bû. “Eşîr”an paşdemayîna civakê temsîl dikirin. Eşîr dihat mehkûmkirin ku bê tune kirin ji bo xatîrê pêşketina kolektîvîteyeke mezintir. Di vê cihanbîniya kolektîvîst de ku şopên islahkirina nijadî di xwe de di hewand, ji bo pejiwandina parçeyên biçûktir ên civakî qet cî tune bû. Ji bo afirîna bituneke tek û yekgirtî divê etnîsîteyên bindest bi hatina helandin. Di vê felsefeyê de, kolektîvîteya mezintir an netewe jînbariya xwe deyndarê ahenga xwe bû. Îdeologên wek Gokalp bawer dikirin ku dewleteke pir-neteweyî ne mimkun bû û netewe divê homojen bûya ku dewlet bikaribe bijî.²⁷ Neteweya wan a muxayel ku ji aliyê elîtên leşkerî ve di hate birêvebirin balatîrîn hebûna etîk û krîter bû ku rastî û şaşiyê bêje. Loma, siyaseta gelheyî pêkhatîyeke girîng a vê îdeolojiyê bû ku di sala 1915an de dem bi dem xwe nîşan da û heta salên 1950î dewam kir.

Di nivîsên Gokalp û îdeologên din de, dîtînen wiha milîtarîstîk bi eşkerekî di hate derbirîn û parastin. Gokalp xelkê civaka xwe ya asayî dişiband afirîndeyên paşdemayî yê Ewropaya beriya Ronsansê ku di bawerîya wî de ji takekesîtiyeke serbixwe bêparbûn ku bikaribin hay ji hewcedariyên xwe hebin. Her wiha bawer dikir, çeşîtdariyek li ser hîmê etnîk wê ji hev biketa ji ber vê encax neteweyeye homojen dikaribû dewleteke populîst (*halkçı*) damezirîne.²⁸ Di dewleteke *halkçı* de yê bijare (*güzdeler*) – efsêrên artêşê û rewşenbîr, ên ku hewcedariyên xelkê dizanin, xwediyê mafê axaftina li ser navê wan bûn. Dewleteke wiha ne mimkun bû kontrola balatîrîn bide destê girseyên cahil (*avam*) ne jî desthilata çînen balatir bi dawî bike û qaîdeya wekheviya li ber zagonan tetbîq bike. *Reîs*, lîderê leşkerî, wek baştirîn kes dihat qebûl kirin ku peywira xilaskirina neteweyê bide ser xwe.²⁹ Civak “wek çavkaniya îdealan, otorî-

27 Uriel Heyd, *Foundations of Turkish Nationalism; the Life and Teachings of Ziya Gökalp* ([London]: Luzac, 1950), r.133.

28 Hyed *halkçı* wek awayekî demokrasiyê wergerandiye, bawer dikim populîzm wê wergereke çêtir be. *Halkçı* di maneya *khalqî* an *khlagarayîya* farişî, *xelkiya* kurdî an *sha'biya* erebî (populîst di maneyek pozîtîf an alîgiriya aliyê gel de) wek dijbera peyva *qewmî* (neteweyî) de.

29 Heyd, *Foundations of Turkish Nationalism; the Life and Teachings of Ziya Gökalp*, rr.131-33.

teya bala ya exlaqî û balatirîn modela rêveberiya etîk tê dîtin.”³⁰ Balatirîn awayê civakê tê tesewirkirin ku li ser mîrata neteweyî (*hars milli*) hatiye damezirandin ku ev civak *reîs* wek lîderê ruhanî û nûnerê xwe yî rastîn dipejirîne.³¹ Bi nerîna ÎTPyê, artêş kakila neteweyê ye yan jî ew bi xwe ye.³² Wek ku nivîsên Gokalp û îdeologên din diyar dikin, ÎTP û Kemalîst artêşê bi neteweyê ve dikin yek û ew wek bilindtirîn modela rêveberiya etîk didîtin.

Gotara Dewleta Tirk (GDT) piranî di nav auraya biyopolîtîk û milîtarîstîk a navbera 1900 û 1930yê de şikil girt û hat sazîkirin. Wisa, bêyî ku derfetê mixalefetê hebe, her cure nîrxê etnîk an neteweyî wek meylên nerazî bi eşîrtiyê hat morkirin. Di nav gotareke îdeolojîk a bi vî rengî de ku artêş û netewe her du yek in, “siyaseta binavkirinê” ji nîşanekê wêdetir diçe. “Eşîrtî” di nav têgihîştîneke wiha de ji her cure çawaniya neteweyî bêpar e û wek nexweşiya neteweyê tê dîtin ku lazîm e li ser bê rawestîna û bê tunekirin. Di gotara ÎTPyê de nexweşiyên wiha divê ji aliyê artêşê, “doktorê neteweyê ve bihata dermankirin. Di vî îdeolojiyê de milîtarîzm û neteweperwerî bi hêsanî ji hev venaqetin; her du bi hev re dimeşin.”³³ ÎTP ku ji ustadên xwe yî alman îlham digirtin cehd kirin temama civaka tirk bikin wek garnîzoneke leşkerî. Di bawerîya wan de, nîrxên leşkerî divê li “hemû qadên civakê” bihata belavkirin, ji ber ku li Almanya dilê xwe pir dibijandinê, rewş wiha bû. Li ser hîmê fikrên wan ên pozîtîvîst-elîtîst, çawaniya hêzên çekdar xwe dispart gelheya ji nav hatine. Neteweyên mezin tenê li ser “çavkaniyên xwe yî fizikî³⁴ û exlaqî diketin şer.”³⁵

30 B.n.b., r.58.

31 B.n.b., r.61.

32 Handan Nezir Akmeşe, *The Birth of Modern Turkey : The Ottoman Military and the March to World War I*, *International Library of Twentieth Century History* (London ; New York New York: I.B. Tauris; Distributed in the U.S. by Palgrave Macmillan, 2005), r.71.

33 B.n.b.

34 Dupat hatiye zêdekirin.

35 Akmeşe, *The Birth of Modern Turkey: The Ottoman Military and the March to World War I*.

Li gor kemalîstan, ger berxwedana kurdan wek berxwedeneke kurd bihata qebûlkin, bi taybetî ya têkçûyî, pêkhînanana wê çî dibe bila bibe wê bihata maneya qebûlkirina duyiniya neteweyê ji aliyê “kakil”a neteweyê, yanê artêşê. Vêga, berxwedana kurd, wek eşîrî, bûbû nexweşî yan asteng ji pêşveçûna “neteweyê bo şer amade”. Artêş netewe ye yan “îradeya neteweyê fermandarê wê ye”³⁶ û loma her cure mixalefeta hundirîn a li hemberî artêşê mixalefeta li dijî neteweyê bi xwe ye jî. Di peywendeke wisa de, polînkirina fermî ya berxwedana kurdan wek eşîrî, wê ji aliyên wê yên etno-neteweyî bê-par dihêle û wê pêşkêş dike wek berxwedaneke herêmî li dijî zagon û nîzame û dijî xizmetên dewletê ku giş bi hev re dibin “hişmendî-ya rêveberiyê”. Tomarên bi vî rengî raber dikin ku şervanên kurd ji bo “eşîrtî”yê û şêwazeke diyar a oldariyê şer kirine. Dewlet hatiye “gelê belengaz li hemberî *irtica*, haydudî û eşîrtiyê biparêze.”³⁷ Ev balkêş e, dewlet awayekî jiyane ya nepênasekirî, yanê eşîrtiyê wek derzagonî îlan dike û dadgeh vê krîmînalîze dike. Hêjayî bibîranîne ye ku projeya dewletê ya ji bo jinûveparvekirina axê, hedefa wê endezyariya civakî bû. Ev, ji bo guhertina demografiya herêmê û li wir bicîkirina tirkên etnîk hat kirin. Ev jinûveparvekirina axê beriya serhildana Şêx Seîd devam dikir.³⁸

Deqên fermî, nemaze di peywenda Tirkiyeyê de, li Kurdistanê her dem îşaretî hevrehêbûna paşverûtiya olî (*irtica*) û eşîrtiyê dikin û van her duyan wek amrazên temamker dibînin ji bo çêkirina ne-yarekî teb’î li dijî modernîteya zordar a dewletê. Resimkirina wiha karîkaturî ya gelekî wek neîteatkar yek-rehendî û wek neyarên teb’î yên zagon û nîzame wek tişteki her tim sabit bimîne xuya nake. Bêyî ku li ser nakokî yan lêhatîniya di navbera oldarî û eşîrtiyê de bê sekinandin, ya ewil, her çî awayê şîroveyan be, ji ya duyem wêdetir e (transcendental). Di keysa kurdan de, yek ji xalên lêkolîner giştî li

36 B.n.b., rr.70-71.

37 B.n.b.

38 Bnr.; Klein, Janet. *Power in the periphery: The Hamidiye Light Cavalry and the struggle over Ottoman Kurdistan, 1890-1914*, teza doktorayê ya neçapkirî, Princeton University, 2002, 424 rûpel; AAT 3067154.

ser li hev dikin ev e ku terîqeta Sufî, nemaze ya Neqşibendî³⁹ di nav kurdên sunî de, wêdetirî hemû eşîr û binyadên wan diçe.⁴⁰

Li vir armanc destnîşankirin e ku çarçovekirina dewletê ya gotarî bo bûyerekê ji bo nerewakirina daxwazan, mafan û îradeya gelheyeke diyar a ji bo tayînkirina dahatûya xwe, wê wan çawa bike heyberên bêdewlet “ku ji halê aîdiyeta qanûnî hatiye derxistin” wek ku Butler-Spivak pênase dikin. Wek mînak, dema hin saziyên dewletê teşekulekê wek terorist bi nav bike, ew teşekul bi awayekî otomatîk derdikeve derveyê mirovayetiye; ti mekanizma tune ye mafên wan biparêze. Pirsra acizker ev e, sedema rewakirina qebûlkirina kategorîkirina dewletan bêyî ku bê rexnekirin çi ye digel ku bi gelemperî kategoriyên wiha ji aliyê exlaqî ve barê wan giran in? Her wiha, çima ewqas derî adetê ye ku bê bawerkirin eşîr jî daxwazên wan ên rewa hene û heqê wan î gotinê heye derheqê şêwaza ku dewlet plana da-

39 Di heman demê de terîqeta Neqşibendî ji destpêka xwe ve, ya di sedsala 18emîn de ji aliyê Mewlana Xalidê Kurdî ve bi gelemperî ji aliyê siyasî ve çalak bû û rêveberan wek hêzekê hesabê dikirin. Ne tesaduf e ku tevgerên kurd ên di navbera 1880 û nivê sedsala 20emîn de bi pêşengiya Şêxên Neqşibendî pêk hatine. Bnr. Martin van Bruinessen, *Agha, Shaikh, and State: The Social and Political Structures of Kurdistan* (London; Atlantic Highlands, N.J., USA: Zed Books, 1992).

40 Wek mînak li jêr pênaseya Bruinessen a ji bo tîkelbûna nasnameya kurdekî: Axêverekî zazayê sunî zaza ye, kurd e, mislimanekî sunî û welatiyê Tirkîyeyê ye. Ew aidî çineke civakî ye û muhtemelen aidî eşîrekê ye jî nişteciyê gundek an newalekê ye û dibe ku pêgirtiyê şêxekî yan endamekî çalak ê rêxistineke siyasî ye. Her yek ji van nasnameyan wextên cuda de serî lê tê dayin. Niha, piraniya zazayan xwe berê berê wek kurd pênase dikin, lê tevgerên wan î civakî û siyasî gelek caran bi sêdaqetên tengtir tînan pênasekirin. Li herêman ku gelek pevçûnên sunî-elewî çêbûne, xwe ji kurd û tirk bêtir wek sunî yan elewî pênase dikin. Peydabûna neteweperweriya kurdekî wek hêzeke girîng a siyasî, gelek kes mecbûr kir ku nasnameyek diyar a etnîk tercîh bikin. Gelek kesên bi qismî yan bi temamî bûbûn ereb an tirk dest pê kirin ji nû ve nasnameya xwe ya kurd a etnîk dupat kirin. Martin Van Bruinessen, “Kurdish Society, Ethnicity, Nationalism and Refugee Problems,” di nav *The Kurds: A Contemporary Overview* ed. Philip G. Kreyenbroek and Stefan Sperl (London ; New York: Routledge, 1992).

hatûya wan datîne? Li Tirkiye û Îranê peywenda dîrokî ya “şerê bi eşîrtiyê” rastî biyopolîtîkaya nijadî, peydebûn û xurtbûna nazîzm û faşîzmê tê. Loma, li vir dupat li ser teb’îeta vê kategorîzasyonê ye ku ji sosyo-polîtîkbûnê zêdetir bû; wechên wê yên etîk û biyo-polîtîk divê ji ber çavan nereve. Ji destpêkê ve siyaseta gelheyê (population politics) di nav gotara dewletê de ciyê xwe girtibû. Qîsmeke mezin a lîteratura lêkolîneriyê li ser israra ÎTPê ya ji bo nexşekirina welêt a li gor çeşitdariya etnîk û olî radiweste.⁴¹ Ligel vê, projeyek hebû ku “riwayatkirina dewletê ya neteweyê” bi rêya neteweyîkirina koka wê, reşkirina hebûna Êdin ji xwe re dikir hedef. Di vê projeyê de serî li gotarên tirkîzm û aryanîzmê didan ku tê de Êdin ji rabirdûyê bê-par dihatin resimkirin. Dihet gotin Êdin eşîr in; dîroka wan a netewesaziyê tunebû, li dû vê dihat gotin dahatûya wan jî tuneye. Li van her du welatan pirtûkên dibistanan tijî bûn bi xuyangên muhteşem ên ariyan û nijada tirk. Nemaze, nijada tirk wek dewletsazker tê nasandin; seransera dîrokê de, wek êndin, çûbin kuderê an kuder dagir kiribin, dewletek ava kirine û şaristaniya xwe dane destpêkirin. Ji ber vê jî, rabirdû tenê aidî ew ên xwedî rabirdûya muhteşem e. Pirtûkên dibistanan ên li Tirkiyeyê hê jî mişt xuyangên wiha yên nijada tirk a xwedî qabiliyeta taybet in. Pirtûkên ji bo dersan ku li ser hatine xebitîn, “hemû cudatî [yên dîrokî] hatine paçînkirin. Ji bo dersên dîrokê *Etnos* li pêş bû, Asyaya Navîn dihanî Rojavaya dûr, yanê Amerîkayê ku Anadol jî wek tekane xeta bandorkirinê bû ku heta niha di şaristaniya cîhanê de hebûye.”⁴²

Di gotara dewletê ya xwe dispêre analîzan de, riwangeya kurdan qet tuneye. Ev analîz raber nakin ka kurd xwe wek “pre-modern, heydûdên eşîrî û qaçaxçî” dibînin an kêşeya wan a bi dewletê re bi projeya wê ya sekuler û navendîkirinê re sînordar e. Herêma

41 Ji bo zêdetir agahiyên li ser vê bnr.; Fuat Dündar, *İttihat ve Terakki'nin Müslümanlar İskân Politikası, 1913-1918*, ç.1., Araştırma-İnceleme Dizisi (Cağaloğlu, İstanbul: İletişim, 2001). Û ———, *Modern Türkiye'nin Şifresi: İttihat ve Terakki'nin Etnisite Mühendisliği, 1913-1918*, ç.1., Araştırma-İnceleme Dizisi (Cağaloğlu, İstanbul: İletişim, 2008).

42 *Citizenship and the nation-state in Greece and Turkey*.

kurdan ciyekî ku ji yekê zêdetir ol lê hene û dewlet baş hay ji vê heye û her tim ev çeşîtdarî ji bo kontrola xwe li vê herêmê xurttir û berfirehtir bike bi kar aniye. Ji ber vê, dewlet baldar bûye ku bûyeran li gor vê bi çarçove bike. Wek mînak, di sala 1920î de, ji bo piştgiyaya kurdên sunî bi dest bixe, dewletê serhildana Koçgiri wek serhildaneke jirêderketî ya dij-xelîfe dax kir, lê di komkujîya gelê Dêrsimê ya 1937an de, heydûdî (*eşkiyalık*) bû têgeha dewletê ku komkujîyê rewya bike. Digel ku tê zanîn kurdên elewî bi qasî kurdên din oldar in, di gotara dewleta tirk de oldariya wan bi temamî bêxwedî bû, ji ber ku ew ne dikaribûn bi hesretkişandina xelîfetiye bên tawanbarkirin û oldariya wan ne ji aliyê dewletê ne ji aliyê civata sunî dihat pejirandin.

Wek berê jî hat diyarkirin, dewlet û Kemalîst ne tenê derbarê daxwazên kurdan ên neteweperwer de guhnedêr bûn; hin car hebûn ku ev nasname û hin daxwazên wan nas dikirin. Yek ji van mînanan, emilandina gotina *irtica* û tetbîqkirina wê ya ji bo serhildana kurdan a di 1925an de ye. Ev ji bo ÎTP û dewama⁴³ wan Kemalîstan gotineke pir girîng bû da ku du şîroveyan îslamê ji hev cuda bikin, şîroveya xwe ya “îslama heqîqî” bidin pêş. Berovajîya hin nerînan, îdeologên ÎTPyê îslam bi xwe wek oleke irticayî yan paşverû îlan nekiribûn. Digel ku hin îdeologên wê xwedî nerînen pozîtîvist-materyalîst bûn jî, li pêş gel hema bêje her tim îslam wek oleke xwedî potensiyela hilberîn an xwedî behreya lihevkerinê be, bi tiştê ew difikirîn wê pêşverûtirîn awayên rêveberinê be, wek mînak meşrutiyet, pêşkêş dikirin û diparastin. Pratîkên bi vî awayî di dewrên dû wan re jî gelek caran hat çavdêrkirin û wexta Kenan Evren de gihişt lutkeya xwe. Ji ber vê ye ku piştî Evren bi hêsanî ne mimkun e îslamîzma tirk ji neteweperweriya tirk bê veqetandin.

Îdeologên ÎTPyê bawer dikirin îslam wê bikaribe yekitiya Ana-

43 Her tim gotina ÎTP û dewama wan a kemalîst bi kar tînim, bawer dikim gelek dîrokzanên tirk wê di vê de pirsgirêk nebînin. Erik J. Zürcher, akademisyenê navdar ê dîroka osmani/tirk di pirtûka xwe *Turkey; A Modern History* de temama salên navbera 1908-1950 de wek serdema Tirkên Ciwan (Genç Türkler dönemi) bi nav dîke.

dolê biparêze. Mustafa Kemal bi xwe îslam wek hîmê bratiya kurd/tirk pêşkêş dikir. Di dawîya 1920an de, Talat Paşa, di hevpeyvîneke bi çapameniya biyanî re digot “îslam oleke mezin e û ew dikare bê astekê ku bikaribe ji hewcedariyên serdema me re bibe bersiv.”⁴⁴ Gokalp, ê ku li ser vê meseleyê bi berfirehî nivîsandiye, pêşî îslamê bi turanîzekirina Xwedayê wê yan bi bicîkirina Xwedê li Turanê, dike neteweyî.⁴⁵ ÎTP û şexsiyetên wek Gokalp hewl didan îslamê modernîze bikin, ne ku ji holê rakin. Gokalp pir zêde di bin bandora nerînên Durkheimî de mabû. Wî serî li ravekirinên bi îtina dida ku dest nîşan bike ku li Erebiistanê saziyên ruhanî ji ber tunebûna saziyên rêveberinê peyda bûne. Loma, li gor xwendina wî, ger îslam di civakeke xwedî burokrasiya dewletê de geş bibe, ne sazîmana ruhanî wê pêwîst be ne jî îslam wê bibe şêwazeke rêveberinê. Angaşt dike, peydabûna îslamê ya di peywendeke cuda ya civakî-siyasî, wê riwangeyeke cuda bidaya îslamê. Wekî mînak, ger qralên romayî yan persî daweta îslamê pejirandibûna, pêxember wê ew mecbûr nekira ku şêwaza rêveberiya xwe biguherînin. Îdia dike, îslam bi qasî *nas* -deqê Quranê- û *hedîsê* -çavkaniya hukmên zagonî- qîmetê dide *‘orfê* -zagona adetî. Gokalp heta bawer dikir, jihevveqetandina ol û saziya ruhanî wê “mimkun bike ku nîrxên bîngehîn ên îslamê bi şarîstana ewropî û çanda tirk a neteweyî re li hev be.”⁴⁶

44 Dündar, r.29.

45 Dema ez li jor [Xwedayê] Dilovan digeriyam,
Min Ew li wir nedît lê li ser rûyê erdê, li Turanê dît
Bo bêtir agahî bnr.; Heyd, *Foundations of Turkish Nationalism; the Life and Teachings of Ziya Gökalp*.

46 B.n.b., rr.85-8.

Niha jî pirtûkên dersa dîrokê yên tirkî propagandaya fikrên guncavî û gerdûniya îslamê, nîrxên ewropî û normên tirkî ên pêş-îslamê dikin. “Kevneşopên tirkî yên pêş-îslamê bi giştî wek bi qaîdeyên îslamî re li hev bin tîrî tarîfkirin: ‘Ji ber vê, tirkî bîyî ku zor li wan bibe bi dilê xwe îslam pejirandin.’ Piştî vê îdiayê demildest, tîrî gotin ku ‘demekê şûn de tirkî pêşengiya ola îslamê bi dest xistin.’” Thalia Dragonas. Ersanli, Buşra. Frangoudaki, Anna “Citizenship and the Nation-State in Greece and Turkey,” di nav *Citizenship and the Nation-State in Greece and Turkey*, ed. Faruk Birtok û Thaleia Dragona (London New York: Routledge, 2005), r.175.

Gokalp ayeta Qur'anê 59/4a şîrove dike û dibêje “îslama heqîqî” ne destê dewletê girê dide di zagonçêkirinê de ne jî ti komên taybet ji bo peywira îctihadê –muhakemeya adlî ya serbixwe- wezîfedar kiriye; îctihad mafê herkesî ye û loma saziyek wek Şêxulîslamî tevî saziyên ruhanî yên din divê bê rakirin. Ji 1912yan heta 1924an, rakirina Xelîfetiye, fraksiyonên ÎTP û Kemalîst gelek bandor kirin li reformên olî ku piranî li gor têgeha *îctihada* Gokalp a dewlet-navendî bû. Dadgehên olî û perwerdeya olî hatin nûkirin û gelek sazî hatin rakirin; niyeta sereke ew bû ku hemû saziyên olî têxin bin kontrola dewletê. Reformên olî tenê parçeyek ji projeya firehkirina kontrola dewletê, hiştin û homojenîzekirina gelheyên mayî bûn. Ev reformên olî ligel rêze-reformên din ên bicîkirinê ku di 1913an de dest pê kiribûn, dimeşîyan. Ji 1912yan têkçûna tirkan a li Balkanan ve heta dawiya deshilatdariya ÎTPyê, versiyonên berê yên osmanîtiyê bi ya tirkperest ve ku siyaseta asimîlekirina gelheyên ne-zal/serdest dişopand, hat guhertin. Li gor Gokalp, “miletê nû yê parçeyek ji osmanîtiyê wê bibûya milletê tirk.”⁴⁷ Siyasetên bi vî awayî li meclisê bû sedema gelek bertekên mezin di nav mebûsên ne-tirk de û teşwîk kir ku hin endamên girîng ên ne-tirk ji ÎTPyê veqetin. Bi damezrîna Komarê, projeya tirkîfîzekirinê xurttir bû bi qedexekirina zimanê kurdî û hemû nîşanên çanda kurdî yên alenî. Tevî vê, di bin navê belavkirina axê (land reform) de endazyeriyê etnografîk jî hat kirin. Kurdên sunî ditirsiyan ji tiştê hatibû serê ermenan bi destê dewleta nû were serê wan jî û ji ber çendê ev tirs tevî kêşeyên din bû û ew ber bi serhildanê ve birin, li çiyekî ku kurdan hêvî kirin bi dupatkirina dij-oldarîbûna dewletê ew ê bikaribin gel li hemberî dewletê li ser xetên etnîk seferber bikin. “Digel ku îdiaya serhildêran ku kemalîst li dijî din in, ne girîngtirîn taktîka di cepxaneyê wan de bû, gazinên din ên li hemberî Enqereyê jî dihat telafuzkirin: ‘Li ser navê populîzmê, zimanê kurdî li qadên giştî hate qedexekirin (1924); li ser navê rakirina feodalîzmê, axayên kurd, lê rewşenbîr jî bo sirgunê hatin şandin rojavaya Tirkiyeyê.’”⁴⁸

47 Dündar, *İctihat ve Terakki'nin Müslümanları İskân Politikası*, 1913-1918, r.33.

48 “Zagoneke nû (No. 1505) derfet dida ku erdê kurdên xwedî-erd bèn

Temam tevdana olê parçeyek plana mezintir bû da ku fahmeke nû ya îslamê ku bikaribe xizmeta rewakirina netewe-dewleteke li ser hîmê misilmantiyê bike.⁴⁹ Xelîfetî demeke dirêj ji aliyê ÎTPê û dewama wê kemalîstan ve hatibû parastin lê taliya talî hate hilweşandin ne ji ber tebî`eta wê ya olî lê ji ber nifûza wê ya sembolîk ku kir kemalîst têkevin tatêlê ku mixalîfên wan “wê li dora Xelîfe li hev bicivin” û ew ji aliyê hêzên mezin neqebûlbar dihate dîtin.⁵⁰ Li vir armanc ne ew e ku bê angaştîkirin endamên ÎTPyê yan kemalîst misilmanên jidil bûn an berovajîya vê lê armanc destnîşankirina têkelbûna îdarekirina dewletê ya kar û barên olî ye. Mirov dikare bi rihetî bigihijê vê encamê ku ÎTP û kemalîstan bawer dikirin, îslam dikare xizmeta rojeva wan a neteweperwer bike û difikirîn versiyo-neke îslama tirkîfîzebûyî mimkun e. Tenê rojek piştî rakirina Xelîfetiyê, 3ê Adara 1924an, *Diyanet İşleri Başkanlığı*, Serokatiya Karûbarên Olî hat damezrandin.⁵¹ Ol, di vî halê guhertî de, hat pîrozkirin

istimlaqkirin û li tirkîaxêverên wê li Kurdistanê bîn bicikirin, bîn belavkirin. Propagandîstên Azadî xwedî li gazinên ji ber vê rewşê derketin û bi vî awayî xitabî gelek kesan kirin.” Bruinessen, Martin, tê neqilkirin di nav David Romano, *The Kurdish Nationalist Movement: Opportunity, Mobilization, and Identity*, Cambridge Middle East Studies (Cambridge, UK ; New York: Cambridge University Press, 2006), 105-06.

49 Dündar, *İttihat ve Terakki'nin Müslümanlar İskân Politikası, 1913-1918*, r.28.

50 Heyd, *Foundations of Turkish Nationalism; The Life and Teachings of Ziya Gökalp*, rr.93-4.

51 Bi afirandina vê saziya nû ku bi îma her cure şîroveyên ji derve qedexa dikir, wek ku Huston xweş diyar kiriye,

[...] *Îslam ji qada giştî hat rakirin û hat xistin bin kontrola Diyanet İşleri Başkanlığı (Serokatiya Karûbarên Olî). Li vir îslam ji nû ve-hat polîtîzekirin da ku piştevaniya projeya dewletê ya sazîkirina neteweyê bike –çareserîyeke klasîk a Hobbesiyan ku demîdest rê li ber ihtimala çêbûna civakeke sivil digre. Di vê rewşê de îslam bi temamî dibe oleke fermî (dewletê), digel ku em dikarin di polîtîkayên dewletê de di navbera serdema yek-partî, desthilatîyê partiyên populîst û serdema piştî darbeya leşkerî ya 1980yî de hin cudatîyan bibînin.*” Christopher Houston, *Islam, Kurds and the Turkish Nation State* (Oxford: Berg, 2001), r. 85.

Xuya ye angaştî ku dewleta tirkî îslam veder kiriye, rewşê zêde basît/asan

û ji bo xizmeta dewletê ji nû ve hat çêkirin. Di peywendên din de, tam jî ev eynî ol wek *irtica* dihat dîtin û divê ji qadên giştî bihata rakirin. Lê, derketina Şêx Seîd wek pêşengekî kurd/oldar ê neteweyî, li Tirkiyeyê têkiliya dewlet û olê ku ji xwe têra xwe têkel bû, têkeltir kir. Serhildana wî ol kir çavkaniyeke seferberiyê û ji bo dewletê kir tehdîdeke heqîqî. Ji vir wê de, kampanyaya kemalîstan li hember hemû tehdîdên muhtemel, ji navendên olî yên hê nû/bakîr in, hat xurtkirin. Oldarî, di nav şêwazên xwe yên curbecur de pêkhatayek nasnameya kurd bû, tenê wek misilmanên din ên osmanî.

Li Tirkiyeyê derbarê têkiliya dewlet û dîn de gelek xebatên akademîk hene. Lê, ev nivîskar li ser serdemeke bêtir modern û gotara demên dawî “îslama siyasî” disekinin. Berovajîya wan, ez li vir armanc dikim têkiliya di navbera neteweperweriya kurdî û îslamê raber bikim ku di heman demê de ji nîqaşên niha wêdetir diçe.

ÇAVKANÎ

Agin, Ömer. *Kürtler, Kemalizm Ve TKP*. İstanbul: VS, 2006.

Akmeşe, Handan Nezir. *The Birth of Modern Turkey: The Ottoman Military and the March to World War I*, International Library of Twentieth Century History. London; New York New York: I.B. Tauris ; Distributed in the U.S. by Palgrave Macmillan, 2005.

Alakom, Rohat. *Eski İstanbul Kürtleri, 1453-1925*, ç.1. İstanbul: Avesta, 1998.

dike. Hin xebatên li ser pirtûkên dersê yên tirkî bandora balkêş a jinûve-polîtîzekerin û jinûve-pêşkeşkirina îslamê wek dîne dewletê dest nişan dikin. Ev girîng e ku ev bê bibîrxistin, senteza tirk-îslamê rehên wê kûr hene di dîroka Tirkiyeya sedsala 20emîn de. Baş tê zanîn, Enwer Paşa, yek ji pêşengên ÎTPê, dema li bandora “pan-îslamizm”ê di nav civatên tirk ên Asyaya navîn hay bû, meyleke zêde îslamî da neteweperweriya xwe. Dewleta tirk bi îsrar bû heta radeyekê di nav neteweya tirkî de îmajê xwe ya îslamî biparêze “[...] Îslam wek parçeyek ji hebûna siyasî ya tirkî tê dîtin, bi taybetî li ciyê ku Komarên Tirkîk ên îro elaqedar bike. Komara Tirkiye ne wek yek ji welatên îslamî lê wek baştirînê welatên Îslamî tê muamelekirin û tê bawerkirin baştirîn tirk li Tirkiyeyê ne.” Dragonas, “Citizenship and the Nation-State in Greece and Turkey,” r.174.

- Asad, Talal. "Political Inequality in the Kababish Tribe." Di nav gotarên nav *Sudan Ethnography Presented to Sir Edward Evans-Pritchard* dited by E. E. Evans-Pritchard, Ian George Cunnison and Wendy James, xvi, 256 r. London: C. Hurst, 1972.
- Beşikçi, İsmail. *M. Kemal Atatürk, Unesco & Destruction of Kurdish Identity in Turkey*. Croydon Park, N.S.W.: Committee for Decolonization of Kurdistan, 1986.
- Beşikçi, İsmail. *Devletlerarası Sömürge Kürdistan*, Bilimsel Araştırma Kitabı. Bonn: Weşanên Rewşen, 1990.
- . *M. Kemal Atatürk, Unesco & Destruction of Kurdish Identity in Turkey*. Croydon Park, N.S.W.: Committee for Decolonization of Kurdistan, 1986.
- Blackledge, Adrian. *Discourse and Power in a Multilingual World*, Discourse Approaches to Politics, Society and Culture. Amsterdam; Philadelphia, PA: John Benjamins Pub., 2005.
- Bruinessen, Martin van. *Agha, Shaikh, and State : The Social and Political Structures of Kurdistan*. London; Atlantic Highlands, N.J., USA: Zed Books, 1992.
- Butler, Judith û Gayatri Chakravorty Spivak. *Who Sings the Nation-State?: Language, Politics, Belonging*. London ; New York: Seagull Books, 2007.
- Chatterjee, Partha. *Nationalist Thought and the Colonial World: A Derivative Discourse?*, Third World Books. London, U.K. Totowa, N.J.: Zed Books; US distributor, Biblio Distribution Center, 1986.
- Darakhshani, Ali Akbar. *Khatirat-I Sartip Ali Akbar Dirakhshani: Az Jan-galha-Yi Gilan Va Luristan Ta Vaqayi'-I Azarbayjan/Major General Ali Dirakhshani's Memoir* [United States?]
- Bethesda, Md.: *The Derakhshani Family*; Distributed by Iranbooks, 1994.
- Dragonas, Thalia. Ersanli, Buşra. Frangoudaki, Anna "Citizenship and the Nation-State in Greece and Turkey." Di nav *Citizenship and the Nation-State in Greece and Turkey*. edit: Faruk Birtek û Thaleia Dragona, xv, 195 r. London New York: Routledge, 2005.
- Dündar, Fuat. *İttihat Ve Terakki'nin Müslümanlar İskân Politikası, 1913-1918*, ç.1., Araştırma-İnceleme Dizisi. Çağaloğlu, İstanbul: İletişim, 2001.
- . *Modern Türkiye'nin Şifresi: İttihat Ve Terakki'nin Etnisite Mühendisliği, 1913-1918/ Modern Turkey's Code; Cup's Ethnic Engineering, 1913-1918*. ç.1., Araştırma-İnceleme Dizisi. Çağaloğlu, İstanbul: İletişim, 2008.

- Heyd, Uriel. *Foundations of Turkish Nationalism; the Life and Teachings of Ziya Gökalp*. [London]: Luzac, 1950.
- Houston, Christopher. *Islam, Kurds and the Turkish Nation State*. Oxford: Berg, 2001.
- . *Kurdistan : Crafting of National Selves*. Bloomington, Ind.: Indiana University Press, 2008.
- Katouzian, Homa “Riza Shah’s Political Legitimacy and Social Base, 1921–1941.” Di nav *The Making of Modern Iran: State and Society under Riza Shah 1921-1941*, edit.: Stephanie Cronin, xi, 279 r., [16] r. of plates. London; New York: Routledge Curzon, 2003.
- Klein, Janet. Power in the periphery: The Hamidiye Light Cavalry and the struggle over Ottoman Kurdistan, 1890–1914, teza doktorayê ya neçapkirî, Princeton University, 2002, 424 rûpel; AAT 3067154.
- Kshani-Sabet, Firoozeh. “Culture of Iranianness; the Evolving Polmics of Iranian Nationalism.” Di nav *Iran and the Surrounding World : Interactions in Culture and Cultural Politics* edit.; Nikki R. Keddie û Rudolph P. Matthee, ix, 393 r. Seattle: University of Washington Press, 2002.
- Kushner, David. *The Rise of Turkish Nationalism, 1876-1908*. London; Totowa, N.J.: Cass, 1977.
- Kutlay, Naci. *İttihat Terakki Ve Kürtler*. ç. 2., Sultanahmet, İstanbul: Koral Yayınevi : Firat Yayınevi, 1991.
- Kutschera, Chris. *Mêjûy Kurd Le Sedey 19-20 Da*. wer: Muhammad Rayyani. Tehran: Sadaf, 1369/1990.
- McCrone, David. *The Sociology of Nationalism: Tomorrow’s Ancestors*, International Library of Sociology. London ; New York: Routledge, 1998.
- Rindler Schjerve, Rosita. *Diglossia and Power: Language Policies and Practice in the 19th Century Habsburg Empire*, Language, Power, and Social Process 9. Berlin ; New York: Mouton de Gruyter, 2003.
- Romano, David. *The Kurdish Nationalist Movement: Opportunity, Mobilization, and Identity*, Cambridge Middle East Studies. Cambridge, UK ; New York: Cambridge University Press, 2006.
- Said Nursi. *İçtimâi Reçeteler-I*.
- Strohmeier, Martin. *Crucial Images in the Presentation of a Kurdish National Identity: Heroes and Patriots, Traitors and Foes*, Social, Economic, and Political Studies of the Middle East and Asia,. Leiden ; Boston: Brill, 2003.

- Vali, Abbas. "The Kurds and Their 'Others': Fragmented Identity and Fragmented Politics." In *The Kurds : Nationalism and Politics*, edited by Faleh A. Jabar and Hosham Dawod, 344 p. London ; San Francisco: Saqi, 2006.
- . "Wki Conflict Resolution Forum" (1998).
- Van Bruinessen, Martin. "Kurdish Society, Ethnicity, Nationalism and Refugee Problems." In *The Kurds : A Contemporary Overview* edited by Philip G. Kreyenbroek and Stefan Sperl, xii, 250 p. London ; New York: Routledge, 1992.
- Yeğen, Mesut. "The Kurdish Question in Turkish State Discourse." *Journal of Contemporary History* 34, no. 4 (1999): 555-68.
- Yeğen, Mesut. "The Turkish State Discourse and the Exclusion of Kurdish Identity." *Middle Eastern Studies* 32, no. 2 (1996): 216-29.